Universität Bremen

Rapora Projeya Lêkolînê ya „Berhevanîna Tevgerên Jinan a li Nav Tirkiyê“

II. Dîzayna Lêkolînê ya Lêkolînên Azmûnî-Wesfînî

Charlotte Binder

Îlon 2017

blickwechsel
Studien zur zeitgenössischen Türkei
Ein Programm der Stiftung Mercator

II. Dîzayna Lêkolînê ya Lêkolînên Azmûnî-Wesfînî

1.1 Çarçoveya Teorîk û Rêbazî

Çarçoveya teorîk a vê lêkolînê tevgerên jinan[1] wek tevgerên civakî yên transnetewî, pirjimar û jihev cuda dinasîne. Ev pênase bingeha xwe ji lêkolîna tevgerên civakî ku perspektîfa femînîst esas digire, distîne (Lenz 2014). Herweha têgeha lekolînê ya hevbirînî (Intersectionality), ku mijarên têkîliyên navbera hêzan û têkiliyên newekhev ên civakî digre dest, di navbera tevgeran de bandora xwe nîşan dide (Walgenbach 2012). Tevger(ên) jinan wek fenomeneke civakî bi teoriyên ku ji hêla lêkolînên tevgerên civakî yên nû[2] hatine pêşxistin, tên şîrove kirin. Tevgerên civakî „ji hêla nasnameyên kolektîf ve bi rêxistinkirin û birêvebirin û bitevgerkirina sazî û grûban“ tên pênase kirin. Armanca wan „bi riya protestoyan di raya giştî de guhertineke civakî“ bidestxistin, lihember sekinîn an jî paş de birin e (Neidhardt û Rucht 1991, p. 450).

Ligel înîsiyatîfên aktorên serbixwe girêdayî vê pênaseyê çalakî û sazî û rêxistinênên piştgir jî dikarin di nav vê pênaseyê de cihê xwe bigirin. Herweha sedem û dînamîkên bitevgerkirinê û pêvajoyên têşeyên protestoyên cuda dikarin bên lêkolîn kirin (Raschke 1985). Herweha bi têgeha „sêgoşeya qedîfe ya polîtîkayên zayenda civakî“ (Woodward 2001, p. 35) têkîlîya tevgerên jinan, têkilîya polîtîkayên jin û zayenda civakî di lijneyên rêveberiyan û di polîtîkayê de û herweha bi zanista femînîst û lêkolînên zayendî tên pênase kirin. Woodward vê têgehê, li gorî Wichterich, „ji bo bandorên bihevre û li ser hev ên a) Aktîvîst û rêxistinên jinan, b) pisporên zanistî û c) femokrat û sîyasetmedaran“ li ser asta polîtîkayên rêxistinên fermî û li ser asta civakê hin di nêz de bên pênase kirin, bi kar tîne. Di vê çarçovê de sêgoşe dibe „qedîfe“ ji ber ku „biyografîyên her sê tîpên aktoran bi hev ve girêdayî ne û carek an jî gelek caran di navbera sê xalan de diguherin (Wichterich 2007, p.10). „Metodolojîya „li ser rê hûrbuyîn“, ango „pirsên wek lêkolîneke çima, çi, û çawa“ (Sturm 2010, p. 400) bi taybetî piştî „krîza temsîlê (representation)“ (Winter 2011, p. 76)[3] pir bi wate dibe. Ji ber vê yekê di hemî

[1] Ji bo „têgeha tevgera jinan” a berfireh di çarçoveya kontexta lêkolînê de li beşa III.1.B. binêrin.
[2] Giştî li ser teoriyên tevgerên civakî yên nû, wek mînak Kern 2008 binêrin û ji bo referansa taybetî ya kategoriya *gender* li Ferree û McClurg Mueller 2006 binêrin.
[3] Bi taybetî antropologên çandî û civakî ji salên 1970‘an vir de ye di çarçoveya ‚mijarên writing-culture-‘ de li ser „krîza temsîla etnografî“ (Fuchs und Berg 1993), herweha li ser „nivîsandina etnografî û wateya wê ya civakî, rol û fonksîyonên dîsîplîne“ (Massmünster 2014, S. 526) de nîqaşan dimeşînin.

pêvajoya lêkolînê de rexneyên (post-) strukturalîst, femînîst û postkolonyalîst ên li hember lêkolînên navend-ewropî-amerîkî, androzentrîk û di ‚pêvajoya othering‘ di hilberînên zanistî de wek bingeh hatin girtin. Bi vî awayî karibû wateya hêza subjektif ji bo eleqeya zanînê û encamên lêkolîne bê aşkere kirin û tevlî pêvajoya lêkolînê bên kirin. Herweha nîqaşên derbarê encamên lêkolînê ku di sala 2016‘an de li Enqerê û li Bremenê bî akademîsyen û aktîvîsten Tirkiyê re hatin kirin, alîkariya pêvajoya rengvedanê kirin.[4]

Ji bo ku kalîteya zanîstî ya lêkolînê bê parastin, di hemî pêvajoya lêkolînê de krîterên lêkolînen civakî yên wesfî, ku ji hêla Ines Steinke ve hatîne formule kirin û ji hêla Lüders ve hatine sererast kirin, hatin şopandin (Lüders 2006a, p. 81).[5]

1.2. Rêbaza Lêkolînê

Pêşketina dizayna rêbazê ku li gorî pirsên lêkolînê hate amade kirin, xwe dispêre metoda pirjimar û têgeha lêkolînê ya etnografîyê (Flick 2006, p. 161–162; Lüders 2006b, p. 151–152). „Navbera rêbaza nîrengî“ (Denzin 1977, p. 308) derfetê dide ku „têkiliyên navbera tegehên ku bi awayekî devkî tên parvekirin û stratejî û avasaziyên tevgerê ku tên şopandin di nirxandina daneyan de“ (Münst 2010, p. 384) bên berçavgirtin. Nêzîkbûna lêkolînê ya giştî, çavdêriya bitevlîbûn, ku bi hevpeyvînên pisporan tê piştgirtin, derfet didin ku „sînorên di qada lêkolînê de xwezayî ne ji holê bên rakirin, herweha zanîn û kiryarên çandî ku di gotinê de ne xuya ne bên bidestxistin.“ (Münst 2010, p. 384) Li gorî Pfadenhauer di pêkanîna hevpeyvînên pisporan de bikaranîna dîzayna lêkolînê ya etnografîk da ku hevpeyvînsaz bi wesiftir bibe û pispor bê naskirin, heta pêwîstîyekê giring e. Bi vî awayî lêkolîner bi riya çavdêriya bitevlîbûn „zanebûna qadê […] û pejirandina li qadê“ bi dest dixe (Pfadenhauer 2009, p. 113). Di pêvajoya lêkolînê de, ku du salan dom kir, li çar heremên lêkolînê li Enqerê, Amedê, li Başûrê Egeyê (Denîzlî û Mugla) herweha li Rojhilata Deryaya Reş (Artvin, Hopa û Trabzon) ji bo ku tevgerên jin ên heyî bi riya perspektîfeke bi giştî bên bidestxistin, destpêkê rêbazen etnografîk ên şopandina

[4] Ji bo têgeha *situated knowledge* binêrin: Haraway 1996 an jî Harding 2004, herweha rexneya postkolonyal a Spivak (2008) ji hilberînên zanistî re binêrin.

[5] Nîqaşên derbarê pîvanên nirxandinê yên lêkolînên wesfî hin jî negihiştine encamekê. Ji ber vê yekê krîterên ji bo lêkolînên wesfî ku ligel Steinke (2000) herweha ji hêla Mayring (2003) û Silverman (2010) ve hatine formule kirin; û herweha krîterên ji bo lêkolînên etnografîk ku ji hêla Breidenstein û yên din ve (2013, p. 184–188) hatine berhevkirin, ji bo vê xebatê wek alîgir hatin dîtin.

bitevlîbûn û belgekirin hatin bikaranîn (Beer û Fischer 2009). Ji bo vê yekê di salên 2014 û 2015’an de bi taybetî tevlîbûnên civînên jin û zayenda civakî yên derbarê 8’ê Adarê ya roja jinan a navnetewî hatin çêkirin. Herweha belgeyên wek mînak daxuyaniyên çapemeniyê, belavok, pankart, poster û nûçeyên medyayê ji bo nirxandina di dorê de hatin berhev kirin.

Li ser bingeha dane û materyalên bidestketî ji bo hevpeyvîna vekiri bi pisporan re pêş-hevpeyvînek hat amade kirin. Bikaranîna pirsan di hevpeyvînekê de hat ceribandin. Ji bo amadekirina û pêkanîna pêş-hevpeyvînê şîretên bikaranînê yên Glaeser û Laudel (2009, p. 111–196) herweha yên Pickel û Pickel (2008, p. 456)[6] alîkar bûn. Ji kesên ku hevpeyvînê dan, pirsên derbarê rêxistinên wan de, mijarên wan, çalakî û amûrên têkiliyê/ragihandinê yên tevgerên jinan, wateya heremê ji bo aktîvîzma polîtîkaya jin û zayendî, herweha fêmkirina jinbûnê û tevgera jin(an) hatin pirsîn. 65 hevpeyvîn bi pisporên tevgerên jinan re di çarçoveya lêkolîna qadê de hatin pêkanîn. Ev hevpeyvîn wek deng hatin qeyd kirin û wek materyala esasî di berhevkirina daneyan de cihê xwe digirin.

Di vê mijara lêkolîna civakî de pispor ne ‚objeyên (bireser)‘ lêkolînê ne, li dijî vê wek şahid*ên pêvajoya lêkolînê tên naskirin (Gläser û Laudel 2009, p. 10–11). Di vê rêbazê de ji bo avakirina mijarên civakî kesên „ji ber tevlîbuna xwe ya zanîna pisporî li ser mijarê bidestxistine“ tên pirsîn (Gläser û Laudel 2009, p. 13). Pispor „ji bo dîzayn, amadekarî, bikaranîn û/an jî kontrola çareserkirina pirsekê de“ berpirsiyar in û bi vî awayî „bidestxistina agahîyan a di derbarê kesan de, rewşên civakî de, di pêvajoyên biryardayînê de, qadên polîtîk de xwedî cihekî bi îmtîyaz in.“ (Meuser û Nagel 2008, p. 470) Herweha pispor „di çarçoveya rêxistinî û sazîyan de wek berpirsiyar“ tên dîtin û „bi vî awayî berpirsiyarî, erk, kar û ligel van tecrube û zanebûnên bidestketî“ têkîldarên mijara lêkolînê ne. Biyografiyên kesayetî nayên lêkolîn kirin, ligel vê „pispor wek temsîla rêxistin an jî saziyan tên dîtîn.“ (Meuser û Nagel 1991, p. 443–444)

Li gor Meuser û Nagel, ku xwe dispêrin Schütz (1972), pêyva pispor cudatiya zanista civakî ya pispor û nepisporan û herweha cudatiya zanîna giştî û zanîna taybet dide der. Dema ku

[6] Ji bo teorî, metod û nirxandina hevpeyvînên pisporan hin çavkaniyên ku wek oryantasyon ji bo pêşxistina dizayna lêkolînên wesfî tên dîtin û ji bo nirxandina daneyan alîkarî didin: Bogner û yên din 2009; Gläser û Laudel 2009; Littig 2011; Meuser û Nagel 1991, 2008, 2010; Mieg û Näf 2006. Rêbera hevpeyvînê ku ji bo vê xebatê hatiye pêşxistin, di pêvekê de dikare bê dîtin.

pêşketina pisporî ji nêzîk ve girêdayî jihev cudahîbûna kar ve girêdayî ye, di civakên paşmodern de zanîna pisporî di derveyî kar de jî tê xulq kirin. Wek mînak aktîvîstên înîsîyatîfên hemwelatiyan, saziyên alikariyê û komên bixwe-alikar an jî kesên di qadên karên civakî de bi awayekî jidil dixebitin, pêk tê. Ev kes „zanebûneke taybet“ bidest dixin û bi vî awayî „di gihaştina agahiyan de xwedi îmtiyaz in.“ (Meuser û Nagel 2010, p. 377)
Bi vê têgihiştinê ji bo vê lêkolînê aktor*ên siyasî yên jin û zayenda civakî wek pispor* hatin dîtin û yên ku di pêvajoya lêkolînê de di nav civaka sîvîl an jî di nav sazî û rêxistinên jin û zayenda civakî de cih digirin re hevpeyvîn hatin çêkirin. Bi rola xwe, bi amadebuyîna xwe û peywîrên xwe yên di nav sazî û rêxistinan de ev aktor* ji bo nîqaş û çalakiyên derbarê politikayên jin û zayendî de xwedî berpirsiyar bûn. Di heman demê de di bidestxistina agahiyan de, wek mînak di pirsa lêkolînê ya derbarê (ne)gengaziya avakirina hevalbendiyê – pêvajoyên heyî yên biryarê de xwedî îmtîyaz in (Meuser û Nagel 2010, p. 377; Pfadenhauer 2009, p. 100). Herweha taybetmendiyên kesayetî yên hevpeyvîn bi wan re hatin çêkirin, wek mînak kar, nasnameya etnîk, an jî temenên wan divê heterojeniya aktor*ên siyasî yên jin û zayendî li herema lêkolînê derdixîne holê, da ku rewşên cuda yên çandî-civakî di hilbêrîna zanîna pisporan de xwe bide der.

Nirxandina daneyên ampîrîk bi alîkariya PC-Software MAX-QDA – vekodkirin û kategorîzekirina materyalên ampîrîk, ango yên transkrîptên hevpeyvînan, protokolên şopandinê û belgeyên li herema lêkolînê hatin berhevkirin – hatin çêkirin. Wek stratejiya şênber a nirxandinê pêvajoya şeş-qonaxî ya Meuser û Nagel ku ji hêla *grounded theory* tê pejirandin, hat hilbijartin (Meuser û Nagel 1991, 2008). Nirxandinên hevpeyvînên pispor*an bi taybetî xwe dispêre analîz û berhevdanên naveroka zanîna pispor*an (Flick 2005, p. 141). Li gorî hevpeyvînên yekane di vê têşeya analîzê de „ji kesayetî wêdetir hevparî […], gotinên derbarê nunerîyê, zanîna parvekirî ya hevpar, avaniya tekîldar û rastiyê, şîrove û mînakên şîroveyê“ tên nirxandin (Meuser û Nagel 1991, p. 452).

Piştî transkrîpsiyona hevpeyvînan, destpêkê hin gotinên hevpeyvînê ku tevlîheviyê kêm dikin û „xêzên veqetandinê yên di navbera mijaran […], gurzên ezmayîşê, û mînakên nîqaşê […], gengazî û têşeyên şopandinê“ yên pispor*an nîşan didin, tên berhev kirin. Dû re berhevdana mijarî yên hevpeyvînan tê çêkirin. Gotinên /mijarên wek hev an jî nêzî hev tên cem hev, herweha sernivîs tên yekkirin. Qonaxa konseptê alikariya xwe ji peyvnasiya (terminolojî)

hevpeyvînerê xelaskirinê dike. Bi alikariya zanîna teorîk û lêkolînên ampîrîk ên din encamên heyî bi zimanekî zanistî hatin wergerandin. Gava nirxandinê, ku bi taybetî gengaziyên bihevve girêdana hin konzeptan digire ber çav, armanca „sîstematîzekirina gengaziyan, curekirin, gelemperîbûn, mînakên şîroveyê“ dike. Di gava dawî ya gelemperîkirina teorîk de teoriyên nêzî mijarên tên xebitandin bi hev ve tên girêdan (Meuser û Nagel 1991, p. 451–466).

1.3 Qadên Lêkolînê

Ev lêkolîn bi hilbijartina çar hereman, taybetiyên cuda yên hereman wek erdnîgarî, aborî-civakî, sîyasî û netew-etnîk-çandî, herweha bi parkirina wek bajar-deşt, herweha bandora van taybetiyan li ser tevgerên jinan digire ber çav.[7] Li gor îstatîstîkên tên diyar kirin, qadên lêkolîne bi taybetiyên bingehîn, wek hejmara gel, oryantasyona siyasi-bîrdozî an jî têkiliyên zayendan (KEİG 2013; TEPAV 2014) tên dîtin. Wek mînak di navbera bajarên Anatolyaya Rojhilat û Başurojhilat û bajarên Rojava yên Tirkiyê de cudahiyên mezin di navbera asta aborî û perwerdê de hene (Altınay û Arat 2009, p. 67–68).[8]

Ji bo lêkolînê herem li gorî krîterên dijberiyê, ku li gor krîterên îstatîstîkî yên cudatiyê hatin hilbijartin, herweha li gorî pêşniyarên pispor*an ên di derbarê berfirehiya mijaran, teşeyên rêxistinan û – avasaziya tevgerên jinan, ku li Tirkiyê li heremên cuda tên dîtin, hatin hilbijartin. Ji bilî van sedeman, di hilbijartinê de sedemên pragmatik ên wek gihiştina sazî û bidestxistina agahiyan de hêsanî û ewlehî jî rol lîstin.

Ligel vê, xala şopandina lêkolînê tenê girêdayî ‚taybetiyên heremî‘ namîne. Lewre dibe ku „di demên global de […] femînîzmên heremî û netewî tune bin“, ji ber ku hemû di tevger û niqaşên global de cihê xwe digirin (Schulz 2007, p.14). Herweha Al-Rebholz jî ji bo çarçoveya lêkolînê ya derbarê Tirkiyê de ahengdariya transnasyonal a pabendbûna sîyasî „ya aktîvîstan

[7] Bi *Spatial Turn*, ku di zanistên civakî û çandî de guhertina paradigmayê nîşan dike, ji dawiya salên 1980’an de ye wek qadeke ji bo mezinbûna çandan tê dîtin û ev wate di analîzên zanistî de tê nirxandin (Döring û Thielmann 2008). An jî ji bo lêkolîna zayendî binêrin: Bauriedl û yên din 2012. Ji bo wateya peyvên *place, space* û *nation* ji bo tevgerên jinan li Nyhagen Predellî 2012 binêrin.

[8] Divê mijarên girêdayî koçberiya hundirîn a ji salên 1950 vir de, konseptên bi du serî wek modern/bajarî/laik/Tirk/ vs. nemodern/gundî/olî/Kurd di çarçoveya Tirkiyê de bi rexnegirî bê dîtin. Wek mînak Altinay û Arat di lêkolîna xwe ya di mijara şîdeta li ser jinê de, têza ku şîdeta li malê tenê wek „pirsgirêkeke rojhilatî“ dibîne şaş derdixînin (2009, xi). Herweha ji bo rexnegiriyên postkolonyal girêdayî nîqaşên moderniteyê binêrin: Göle 1996

ji çarçoveya rêxistinî, aborî, bîrdozî û danûstendina entelektuel û piştgirî bi tevgerên jinên navnetewî û torên femînîst ên dersînor wêdetir dinirxîne.“ (Al-Rebholz 2011, p. 29) Ji ber vê yekê wateya torên femînîst ên navnetewî ji bo pêşketina stratejîk û daxwazên transnetewî, herweha ji bo damezrandina têkiliyên global ên femînîst di nirxandina aktîvîzma heremî ya jin û zayendî de ber çav hatin girtin.

Li jêr heremên lêkolînê ku li gor krîterên taybet – û herweha li gorî daxuyaniyên pispor*ên siyasî yên jin û zayenda civakî yên hereman bi xwe – hatine hilbijartin, tên nasandin. Bajarê Tirkiyê ya herî mezin Stenbol, ji hêla pispor*an ve di çarçoveya sîyasetên jin û zayenda civakî de gelek bi wate hat nirxandin (wek mînak: Kalkan 2014: 31; Özkazanç 2014: 40; Ülker 2014: 36). Lê ji ber ku di çarçoveya mijara vê lêkolînê de gelek nivîs û lêkolînên cuda cuda di derbarê bajarê Stenbolê de hene (Binder 2016; Somersan 2011), ji bo vê lêkolînê bi zanebûn heremên cuda hatin hilbijartin.

Bajarê **Enqerê** paytexta Komara Tirkiyê, ya ku di sala 1923’an de hat avakirin, e. Bi qasî 5 milyon kes li vî bajarî dijîn û duyemîn bajarê mezin ê Tirkiyê ye. Ev bajarê mezin ji sala 1994’an vir de ye ji hêla Siyasetmedarê AKP İbrahim Melih Gökçek ve tê birêvebirin. Di hilbijartinên heremî yên sala 2014’an de Partiya Maf û Geşepêdanê AKP bi % 44,9 dengî ji Partiya Komar a Gel CHP ku ji %43,8 girtibû, zêdetir deng girt û dîsa bû partiya herî denggirtî.[9] Girêdayî mijarên wekheviya zayendan de, di beşên perwerde, tevlîbûna sîyasî, kar, tenduristî û karên jinan de Enqere li gorî 81 bajarên din ên Tirkiyê de di rêza 15. de ye (TEPAV 2014, p. 9–10).

Di hevpeyvînan de Pispor Enqerê ji ber statuya wê ya paytexta Tirkan e û „navenda“ (merkez) hikûmetê û rêveberiyê ye, ji bo tevgerên jinan ên li Tirkiyê bi wate dinirxînin. Ji ber ku nêzî parlamentoya Tirkan e û navendên partiyan li Enqerê ne, wek mînak li gor Aksu Bora di hevpeyvîna xwe de tîne ziman, guhartina zagonan ji hêla aktor*ên sîyasî yên jin û zayenda civakî ve bi rexnedarî tên şopandin an jî daxwaz kirin (Bora 2014: 37-38). Li gorî Alev Özkazanç ji ber vê nêzikbûnê mijarên wek polîtîkayên (hikumetê) û herweha tevlîbûna sîyasî û temsîlîyet di tevgerên muxalîf ên bajêr de roleke taybet dilîze (Özkazanç 2014: 40).

[9] Ji bo encamên hilbijartinên heremî ya sala 2014’an ên qadên lêkolînê ku bi giştî AKP bi %45,6 CHP % 27,8 û MHP %15,2 deng girtin, binêrin: http://secim.haberler.com/2014/.

Engere di heman demê de navenda gelek saziyên derveyî hikumetê (NGO) yên Tirkiyê ye û herweha cihên gelek saziyên navnetewî, wek YN (Yekîtiya Netewan) an jî YE (Yekîtiya Ewropa) ye, herweha sefaretên biyanî li vir in (Acar 2014: 40; Sancar 2014: 46). Ji ber vê yekê, wekî ku Nesrin Semiz tîne ziman, lobiyên derbarê daxwazên polîtîkayên jin û zayendî hêsantir tên meşandin (Semiz 2014: 36). Hin hevpeyvîner têkiliyên teng ên saziyên sîvîl û avaniyên dewletê, wek mînak têkiliyên bi wezareta malbat û politikayên civakî, tînin ziman.

Herweha hebûna zanîngehên bi nav û deng, wek Zanîngeha Teknîk a Rojhilata Navîn (Orta Doğu Teknik Üniversitesi), Zanîngeha Enqerê (Ankara Üniversitesi) an jî Zanîngeha Hacettepê (Hacettepe Üniversitesi) bandor li ser tevger(ên) jinan ên bajêr dikin, Ferîde Acar vê yekê wek „hin entelektueltir“ (*daha entelektuel*) bi nav dike (Acar 2014: 38). Dema Çağlayan ji bo Enqerê îfadeya „dînamîzma xwe ya heremî“ (*kendi yerel dinamizmi*) red dike (Çağlayan 2014: 40), hevpeyvînerên din qala kevneşopiya dîrokî ya politikayên jin û zayendî dikin (Başak 2014: 78; Kapusuz-Kütküt 2014: 37). Li gorî nêrîna Selen Doğan jinên ji derdora heremê, jinên bajarê mezin Enqerê wek „rol-model“ dibînin û lewre jî ji wan hêviyên wan hene (Doğan 2014: 46).

Diyarbekir – bi Kurdî Amed – bi nifusa xwe ya 1 mîlyonî bajarê herî mezin a herema Kurdan a Başûrrojhilatê Tirkiyê ye. Di hevpeyvînan de jî bajêr wek „paytexta tevgera Kurd“ (*Kürt hareketinin başkenti*) (Zin & Emek 2015: 73) an jî wek „dilê tekoşîna azadiya Kurdan“ (*Kürt Özgürlük Mücadelesi'nin kalbi*) (Aktaş 2015: 15) hat pênase kirin. Di hilbijartinên heremî ya sala 2014'an de Partiya Gelan a Demokratîk HDP – li Diyarbekirê ji % 55,1 dengî girt, ligel vê AKP li bajêr ji % 35 dengî girt. Bajarê mezin ji dehan salan vir de ye ji hêla partiya Kurd-Çepgirt tê birêvebirin, sîstema hevserokatî (*eşbaşkanlık sistemi*)[10] û kotaya jinan ji bo şaredarî û rêveberiya bajêr tê meşandin. Girêdayî wekheviya zayendan di beşên perwerde, tevlîbûna polîtîk, tendurîstî û kar de Diyarbekir li gorî 81 bajarên din ên Tirkiyê de di rêza 33. de ye (TEPAV 2014, S. 80). Li gorî hevpeyvînerek, ku seroka komeleyekê ye, li Diyarbekirê gelek penaberên neperwerdekirî û bi kêm dahatî dijîn (Anonym 2015: 43). Li heremên Kurdan – bi taybetî li Diyarbekirê – ji salên 1990'an vir de ye di navbera dewleta Tirk û Partiya Karkerên Kurdistan PKK ya qedexekirî de pevçûnên rengê şer de diqewimin. Ligel vê Tevgera Jina Kurd –

[10] Birêvebirina sazî û dezgeyên partiyeke siyasî ji hêla jin û mêrekê ve.

him di bin êrîşên dewleta Tirk, him jî di bin tepisandinên civaka feodal de – „bîrdoziya azadiya jinê“ (*kadın kurtuluş ideolojisi*) pêş xist û rêxistinbuyîneke mezin ava kir (Aras 2015: 36). Ji ber vê yekê hin pispor Tevgera Jina Kurd a Amedê him ji ber pirhejmariya saziyan, him jî bi giştî ji ber aktîvîstên jin ên Kurd, ku ji bo tevgerên jinan ên Tirkiyê wek mînak in, „gelek cîwan, bi coş“ (*çok gençtir, heyecanlıdır*) nirxandin (z.B. Akkoç 2015: 67; Çiçek & Gülen 2015: 72).[11]

Ji bo **herema Egeyê** ku ji heşt bajarên Başûrrojavayê Tirkiyê pêk tê, bajarên Denizliyê ya bi 350 000 nifûsî û Muğlayê bi qasî 65 000 nifûsî hatin hilbijartin. Bi zanebûn li herema Egeyê giringî li ser bajarên piçûk hat danîn, da ku aktîvîzma siyasî ya jin û zayenda civkîî ji derveyî bajarê mezin Îzmîrê, ku lîberal û rojavayî tê nasîn, karibe bê lêkolîn kirin. Di hilbijartinên heremî ya sala 2014'an de li Denizliyê AKP ji % 45,3, ligel vê CHP ji % 38,7 dengî girt. Li Muğlayê CHP bi % 49,1 dengî li pêşiya AKP ya bi % 29 dengî sekini. Him Denizli bi rêza 11. û him jî Muğla bi rêza 13. di lekolîna TEPAVê (2014, p. 79) ya derbarê wekheviya zayendî de li gorî bajarên din cihekê baş girtin.

Li Denîzliyê gelek şîrketên ku endustriya textilê dikin hene, ji ber vê yekê kotaya karkirina jinê bilind e. Bilsen Özen û aktîvîstên din ji ber vê yekê di hevpeyvînê de qala ‚rihê karsaziyê‘ yê jinan, ku bi awayekî aktîf di angajmana civakî polîtîk de jî derdikeve holê, dikin (Özen û yên din 2015: 137-139). Li gorî Hilal Can jin li Denîzliyê „bi hêz“ (*güçlü*) û „giranbuha“ (*değerli*) ne. Hilal Can îfadeya xwe bi dîroka bajêr ve ku di dîrokê de sê navên jinan girtiye – Laodike, Hierapolis und Aphrodisias –û bi kevneşopiya ku keçikên ji Denîzliyê ji derveyê bajêr nazewicin ve girê dide (Can 2015: 23-25).

Lê belê bajarê Muğlayê ku di sala 1991'an de Lale Aytaman wek yekemin waliya jin li Tirkiyê li wir xebitî, bi cotkarî, tûrîzm û bi koçberiya ji YE'yê û Rûsyayê tê zanîn. Aktîvîst Zeze Muğlayê wek „herema betlaneyê“ (*tatil yöresi*), ku gelê li wir pir kêm civakî polîtîk aktîv in, dinirxîne (Zeze 2015: 48). Lê Gaye Cön balê dikişîne ser koma piştgiriya jinan a li Muğlayê ku di dawiya 1980'an de wek avasaziya yekemîn a siyasî ya jinan ji derveyî bajarên Stenbol, Enqere û Îzmîrê hatîye damezirandin (Cön 2015: 52). Têkiliya taybet a di navbera tevgera jinan a femînîst û tevgera hawirdorê ya li Muğlayê û bejahiya wê ji hêla Dilek Bulut û Özlem Şahin Güngör ve

[11] Di derbarê têkiliyên di navbera Tevgera Jinen Kurd û tevgerên jinan ên din li Tirkiyê binêrin: III.2.B.

hatin bilêv kirin (Bulut 2015: 41; Şahin Güngör 2015: 44).

Ji **Herema Deryaya Reş,** ku li bakûrê Tirkiyê ye û ji 18 bajaran pêk tê, bajarên Trabzon û Artvîn ê ku li Bakûrrojhilatê heremê dimînin, hatin hilbijartin. Di hilbijartinên heremî ya di sala 2014'an de li herdû bajêr AKP bi % 59,5 û % 46,3 dengan li pêş CHP'ê ku ji %24,9 û %36,9 dengan girt, sekinî. Girêdayî wekheviya zayendî di beşên perwerde, tevlîbûna sîyasî, kar, tendurîstî û şixulên ji bo jinan de Trabzon ligel 81 bajarên Tirkiyê de di rêza 10. de û Artvîn di rêza 32. de cihê xwe digirin (TEPAV 2014, p. 79).

Di hin hevpeyvînan de jinên ji Trabzonê, ku ji 300 000 nifûsî pêk tê, „bi hêz“ (*güçlü*) hatin pênase kirin. Emîne Altuntaş ji bo pozîsyona bilind a jinê taybetî serxwebûna aborî wek sedem dibîne. Ji ber rewşa xerab a aborî gelek mêr neçar manê koçî deverên din kirine, ji ber vê sedemê jin û zarok li herema Deryaya Reş bi serê xwe mane (Altuntaş 2015: 33-36). Herweha Bahar Bostan bi berhevanîna Enqerê qala taybetiya tevna jina Deryaya Reş dike. Li gor wê li Deryaya Reş tevna jinê „hin takekesî“ (*daha birey*) û „bi hêztir“ (*daha güçlü*) e, xwedî „giyaneke xofane ya tekoşînê“ (*müthiş mücadeleci bir ruh*) ye û „herweha enerjiyek pir xweş“ (*güzel de bir enerji*) e (Bostan 2015: 46-48). Ev yek xwe di tekoşîna jinên heremê ya li hember bendavên hîdroelektrîk ên ji hêla hikumeta Tirk ve tên plansazî kirin û ji derdorê re xetere ne, nîşan dide (Arduç et al. 2015: 35). Ligel vê Pelin Şirin qala „binyateke girtî û netewperest“ (*milliyetçi, kapalı bir yapı*) dike (Şirin 2015: 35), ku Şahînde Yavuz jî vê yekê bi bandora giran a sekna patriyarkal û nêr pênase dike (Yavuz 2015: 27).

Li bajarê Artvînê ku 35 000 nişteciheên wê hene û li navçeya Hopaya bi 30 000 nifûsî hevpeyvîn hatin çêkirin. Aktîvîstên herdû bajaran giliyên xwe di derbarê kêm – hişmendiya siyasî ya jinan a li bajarê Artvînê kirin (wekî mînak Arıcı & Anonym 2015: 95; Vayiç Aksu 2015: 9). Nurcan Ay Katırcı vê yekê bi „mirovên rihet“ (*rahat insanlar*) ve girê dide. Li gor Katırcı li vir pestandina olî an jî sîyasî û herweha li gor deverên din rêjeya şîdeta nav malê kêm e (Ay Katırcı 2015: 70). Jin li gorî Ay Katırcı li bajarê Artvînê, ku li wir gelek dikan ji hêla jinan ve tên birêvebirin, jin dikarin êvaran jî bê talûke li kolanan bigerin (Ay Katırcı 2015: 68-70). Özge Zeynep Arıcı balê dikişîne ser cihê erdnîgariya bajarê biçûk a derdora wî bi çiyayan ve dorpêç kiriye, ku kêmbûna çalakiyên dema vala ji bo jinan pê ve girêdide (Arıcı & Anonym 2015: 90). Ji ber navçeya Hopayê li ber sînora Gurcîyan e „sektora fihuşê“ (*fuhuş sektörü*) bandora xwe li vir

dike (Vayiç Aksu 2015: 9). Taybetiyeke Hopayê jî ji derbeya leşkerî ya 12 Îlona 1980 vir de kevneşopiya wê ya çepgirt e (Arduç et al. 2015: 34). Wek mînak Hopa berê ji hêla serokê Şaredariyê Yılmaz Topaloğlu ku ji Partiya Azadî û Demokrasiyê ÖDP bû, hat birêvebirin.

Çavkanî

- Abu-Lughod, Lila (1996): Gegen Kultur Schreiben. di nav: Ilse Lenz, Andrea Germer und Brigitte Hasenjürgen (Ed.): Wechselnde Blicke. Frauenforschung in internationaler Perspektive. Opladen: Leske + Budrich, p. 14–46.
- Al-Rebholz, Anıl (2011): Frauenpolitik in der Türkei im Spannungsfeld zwischen Lokalem und Transnationalem. Di nav: *GENDER. Zeitschrift für Geschlecht, Kultur und Gesellschaft* 1, p. 28–46.
- Altınay, Ayşe Gül; Arat, Yeşim (2009): Violence against Women in Turkey. A nationwide Survey. Navnîşana Online http://www.kadinayoneliksiddet.org/KYS_ENG.pdf, nêrîna herî dawî 01.03.2013.
- Bauriedl, Sybille; Schier, Michaela; Strüver, Anke (Ed.) (2010): Geschlechterverhältnisse, Raumstrukturen, Ortsbeziehungen. Erkundungen von Vielfalt und Differenz im Spatial Turn. Münster: Westfälisches Dampfboot.
- Beer, Bettina; Fischer, Hans (2009): Wissenschaftliche Arbeitstechniken in der Ethnologie. Berlin: Reimer.
- Bethmann, Stephanie; Helfferich, Cornelia; Hoffman, Heiko; Niermann, Debora (Ed.) (2012): Agency. Die Analyse von Handlungsfähigkeit und Handlungsmacht in qualitativer Sozialforschung und Gesellschaftstheorie. Weinheim: Beltz Juventa.
- Binder, Charlotte (2016): Der Internationale Frauentag nach der Dekonstruktion von Geschlecht. Eine empirisch-qualitative Vergleichsstudie zu Bündnispolitiken im Rahmen des 8. März in Berlin und in Istanbul. Dissertationsschrift. Universität Bremen, Bremen.
- Bogner, Alexander; Littig, Beate; Menz, Wolfgang (Ed.) (2009): Experteninterviews. Theorien, Methoden, Anwendungsfelder. Wiesbaden: VS.
- Breidenstein, Georg; Hirschauer, Stefan; Kalthoff, Herbert; Nieswand, Boris (2013): Ethnografie. Die Praxis der Feldforschung. Konstanz: utb.
- Denzin, Norman K. (1977): The Research Act. A theoretical Introduction to sociological Methods. New York: Sage.
- Döring, Jörg; Thielmann, Tristan (Hg.) (2008): Spatial Turn. Das Raumparadigma in den Kultur- und Sozialwissenschaften. Bielefeld: transcript.
- Ferree, Myra Marx; McClurg Mueller, Carol (2006): Gendering Social Movement Theory. Opportunities, Organziations and Discourses in Women's Movements worldwide. Di nav: Anja Weckwert und Ulla Wischermann (Ed.): Das Jahrhundert des Feminismus. Streifzüge durch nationale und internationale Bewegungen und Theorien. Königstein/Taunus: Ulrike Helmer, p. 39–60.

- Flick, Uwe (2005): Qualitative Sozialforschung. Eine Einführung. Hamburg: Rowohlt.
- Flick, Uwe (2006): Triangulation. Di nav: Ralf Bohnsack, Winfried Marotzki und Michael Meuser (Ed.): Hauptbegriffe Qualitativer Sozialforschung. Ein Wörterbuch. Stuttgart: Barbara Budrich, S. 161–162.
- Fuchs, Martin; Berg, Eberhard (Hg.) (1993): Kultur, soziale Praxis, Text. Die Krise der ethnographischen Repräsentation. Frankfurt/M.: Suhrkamp.
- Gläser, Jochen; Laudel, Grit (2009): Experteninterviews und qualitative Inhaltsanalyse. Wiesbaden: VS.
- Göle, Nilüfer (1996): The forbidden Modern. Civilization and Veiling. Ann Arbor: University of Michigan.
- Haraway, Donna (1996): Situiertes Wissen. Die Wissenschaftsfrage im Feminismus und das Privileg einer partialen Perspektive. Di nav: Elvira Scheich (Ed.): Vermittelte Weiblichkeit. Feministische Wissenschafts- und Gesellschaftstheorie. Hamburg: Hamburger Edition, p. 217–248.
- Harding, Sandra (Ed.) (2004): The Feminist Standpoint Theory Reader. Intellectual and Political Controversies. New York, London: Routledge.
- KEİG (2013): Türkiye'de Kadın Emeği ve İstihdamına yönelik Politikalar. Kadın Emeği ve İstihdamına dair Politika ve Faaliyetlerin 12 İlde Değerlendirilmesi. Istanbul.
- Kern, Thomas (2008): Soziale Bewegungen. Ursachen, Wirkungen, Mechanismen. Wiesbaden: VS.
- Lenz, Ilse (2014): Geschlechter in Bewegung? Di nav: Barbara Rendtorff, Birgit Riegraf und Claudia Mahs (Ed.): 40 Jahre Feministische Debatten. Resümee und Ausblick. Weinheim: Beltz Juventa, p. 12–30.
- Littig, Beate (2011): Interviews mit Experten und Expertinnen. Di nav: Sabine Maschke und Ludwig Stecher (Ed.): Enzyklopädie Erziehungswissenschaften Online. Weinheim, München: Juventa, p. 1–17.
- Lüders, Christian (2006a): Gütekriterien. Di nav: Ralf Bohnsack, Winfried Marotzki und Michael Meuser (Ed.): Hauptbegriffe Qualitativer Sozialforschung. Ein Wörterbuch. Stuttgart: Barbara Budrich, p. 80–83.
- Lüders, Christian (2006b): Teilnehmende Beobachtung. Di nav: Ralf Bohnsack, Winfried Marotzki und Michael Meuser (Ed.): Hauptbegriffe Qualitativer Sozialforschung. Ein Wörterbuch. Stuttgart: Barbara Budrich, p. 151–152.
- Lüdtke, Nico; Matsuzaki, Hironori (Hg.) (2011): Akteur – Individuum – Subjekt. Fragen zu ‚Personalität‘ und ‚Sozialität‘. Wiesbaden: VS.
- Massmünster, Michael (2014): Sich selbst in den Text schreiben. Di nav: Christine Bischoff, Caroline Oehme-Jüngling und Walter Leimgruber (Ed.): Methoden der Kulturanthropologie. Bern: Haupt, p. 522–538.
- Mayring, Phillip (2003): Qualitative Inhaltsanalyse. Grundlagen und Techniken. Weinheim: utb.
- Meuser, Michael; Nagel, Ulrike (1991): ExpertInneninterviews - vielfach erprobt, wenig bedacht. Ein Beitrag zur qualitativen Methodendiskussion. Di nav: Detlef Garz und Klaus Kraimer (Ed.): Qualitative empirische Sozialforschung. Konzepte, Methoden, Analysen. Opladen: Westdeutscher, p. 441–471.
- Meuser, Michael; Nagel, Ulrike (2008): Das Experteninterview. Konzeptionelle Grundlagen und

methodische Anlage. Di nav: Susanne Pickel, Gert Pickel, Hans-Joachim Lauth und Detlef Jahn (Ed.): Methoden der vergleichenden Politik- und Sozialwissenschaft. Neue Entwicklungen und Anwendungen. Wiesbaden: VS, p. 465–479.

- Meuser, Michael; Nagel, Ulrike (2010): Expertinneninterview. Zur Rekonstruktion spezialisierten Sonderwissens. Di nav: Ruth Becker und Beate Kortendieck (Ed.): Handbuch der Frauen- und Geschlechterforschung. Theorie, Methoden, Empirie. Wiesbaden: VS, p. 376–379.
- Mieg, Harald A.; Näf, Matthias (2006): Experteninterviews in den Umwelt- und Planungswissenschaften. Eine Einführung und Anleitung. Berlin: Pabst Science.
- Münst, Agnes Senganata (2010): Teilnehmende Beobachtung. Erforschung der sozialen Praxis. Di nav: Ruth Becker und Beate Kortendieck (Ed.): Handbuch der Frauen- und Geschlechterforschung. Theorie, Methoden, Empirie. Wiesbaden: VS, p. 380–384.
- Neidhardt, Friedhelm; Rucht, Dieter (1991): The Analysis of Social Movements. The State of the Art und Some Perspectives for further Research. Di nav: Dieter Rucht (Ed.): Research on Social Movements. The State of the Art in Western Europe and the USA. Frankfurt/M.: Campus, p. 421–464.
- Nyhagen Predelli, Line (2012): Recognising Place, Space and Nation in researching Women's Movements. FEMCIT. Di nav: *Women's Studies International Forum* (35), p. 141–143.
- Pfadenhauer, Michaela (2009): Das Experteninterview. Ein Gespräch zwischen Experte und Quasi-Experte. Di nav: Alexander Bogner, Beate Littig und Wolfgang Menz (Ed.): Experteninterviews. Theorien, Methoden, Anwendungsfelder. Wiesbaden: VS, p. 99–116.
- Pickel, Gert; Pickel, Susanne (2008): Qualitative Interviews als Verfahren des Ländervergleichs. Di nav: Susanne Pickel, Gert Pickel, Hans-Joachim Lauth und Detlef Jahn (Ed.): Methoden der vergleichenden Politik- und Sozialwissenschaft. Neue Entwicklungen und Anwendungen. Wiesbaden: VS, p. 441–464.
- Raschke, Joachim (Hg.) (1985): Soziale Bewegungen. Ein historisch-systematischer Grundriss. Frankfurt/M.: Campus.
- Schulz, Ulrike (2007): Feminismus zwischen Identitätspolitiken und Geschlechterkonstruktionen. Gibt es einen Raum für internationale feministische Solidarität? Navnîşana Online http://web.fu-berlin.de/gpo/pdf/tagungen/ulrike_schultz.pdf, nêrîna herî dawî 26.06.2014.
- Schütz, Alfred (Hg.) (1972): Gesammelte Aufsätze II. Njimwegen.
- Silverman, David (2010): Doing Qualitative Research. London: Sage.
- Somersan, Bihter (2011): Feminismus in der Türkei. Die Geschichte und Analyse eines Widerstands gegen hegemoniale Männlichkeit. Münster: Westfälisches Dampfboot.
- Spivak, Gayatri Chakravorty (2008): Can the subaltern speak? Postkolonialität und subalterne Artikulation. Wien: Turia+Kant.
- Steinke, Ines (2000): Gütekriterien qualitativer Forschung. Di nav: Uwe Flick, Ernst von Kardorff und Ines Steinke (Ed.): Qualitative Forschung. Ein Handbuch. Reinbek: Rowohlt, p. 319–331.
- Sturm, Gabriele (2010): Forschungsmethodologie. Vorüberlegungen für eine Evaluation feministischer (Sozial)Forschung. Di nav: Ruth Becker und Beate Kortendieck (Ed.): Handbuch der Frauen- und Geschlechterforschung. Theorie, Methoden, Empirie. Wiesbaden: VS, s. 400–408.

- TEPAV (Hg.) (2014): 81 İl için Toplumsal Cinsiyet Eşitliği Karnesi. Türkiye Ekonomik ve Toplumsal Araştırmalar Vakfı. Ankara. Navnîşana Online http://www.tepav.org.tr/upload/files/haber/1391012395-8.81_Il_icin_Toplumsal_Cinsiyet_Esitligi_Karnesi___Taslak.pdf, nêrîna herî dawî 01.09.2014.
- Walgenbach, Katharina (2012): Intersektionalität. Eine Einführung. Navnîşana Online http://portal-intersektionalitaet.de/theoriebildung/schluesseltexte/walgenbach-einfuehrung/, nêrîna herî dawî 22.07.2014.
- Wichterich, Christa (2007): Transnationale Frauenbewegungen und Global Governance. Die Politik des Möglichen zwischen Emanzipation, Selbstregulierung und Anpassung. Navnîşana Online http://www.fu-berlin.de/sites/gpo/int_bez/globalisierung/Transnationale_Frauenbewegungen/index.html, nêrîna herî dawî 28.08.2014.
- Winter, Rainer (Hg.) (2011): Die Zukunft der Cultural Studies. Theorie, Kultur und Gesellschaft im 21. Jahrhundert. Bielefeld: transcript.
- Woodward, Alison (2001): Die McDonaldisierung der internationalen Frauenbewegung. Negative Aspekte guter Praktiken. Di nav: *Zeitschrift für Frauenforschung & Geschlechterstudien* 19 (1+2), p. 29–45.